VÎNIYA

Civakên tepeserkirî, her dem hest bi zirbehrî û neçalakiyê dikin. Ne ji ber hindê ku ne çalak in, lê çinku bûye pişkek ji jînenîgara kesan. Her tiştekê bi jiyana mirovî ve hevbend be, verêj û mitayê civakiye û civak giringiyê dide. Di civaka me ya kurdewarî de saleha sal e stema hevder û rijîmên dagîrkerên welatê kurdan hewl didin ku kesatiya normal a kurdî nehêlin û ber goma bikin ku dikare hizrên karîger bike.

Dr. Arif Hîto

Ev jî bûye egerê wê çendê ku her dem kesê kurd li berhem û verêja xwe ya hizrî bi goman be. Her çende ev şêwazê bergomankirina hizran kiryareka azrêner û palêner rêka rastî û rewaniye. Lê demê ev ji xwe ne razîbûne bibe pişkek ji kesatiyê û rêkê li hizirkirina rexneyî û saxlem bigire, hingê dibe reftareka nêgetiv û hindek bi girêyeka derûnî li qelem didin. Ereb vê pirsê bi girê ya xewaceyî li qelem didin, her kesekê biyanî ji xwecihan baştir, jêrtir, lawtir û mêrtir e. Ev hestpêkirina bi mezinahiya yê dî, dibe egerê hestkirina bi nizmiya xwe.

Xwenizimdîtin, ne tinê girêyeka derûniye. Belku arêşeyeka civakiye jî, çinku ewê xwe nizim dibîne, hemû derdorên xwe jî mizim dibîne, di encam de neşê mifayî ji xalên pozîtîfên civakî wergire û her wesa neşê çi zêdehiyan li ser verêja hizriya civakî jî bike. Lewra her tiştekê baş di civaka xwe de kêm biha dike û bihayên civakî yên xelkê, kêm biha bin jî, bi çavekê mezin lê dinêre. Di vê hevkêşê de, ewên xwe nizim dibînin, neşên civakê xwe bigehînine astê civakên dî, yan neşên di nav civakên dî de bijîn û guncayî bin, her wesa bihayên xwe yên civakî jî, ji dest didin. Evca, mîna şervanên bê çek, yan nivîskarên bê doz di nav gilêşoka hizran de berze dibin.

Ev giriya derûnî dibe egerê tênegehiştina civakî û şêlîkirina mînakê heyî jî. Demê kesek biyanî dihê deverê wesa rewşa xwe bo şîrove dikin, her weku hêşta em li sedê heftêne, ji bîr dikin ku di van pazde salên borî de, gelek kiryarên pozîtîf û berhemhêner hatîne encamdan, her wesa ji bîr dikin ku kesê kurd şiyanên xwe guncan û guhorên û nûkirinê jî hene. Her dem rewşa civakekê ya henokeyî ji ya berî çend salan baştir be û ya berî çend salan jî ji ya berî xwe baştir û pêşkevtîtir be. Ev ramana pêşkevtin û karîgeriya wê civakê dide. Pêşkevtina civakan bi rabirdûyê wan dihêne pîvan, ne bi hemberkirina wan di gel civakên gelek pêşkevtî. Her pêşkevtineka peyîskî be mana wê pitewtir û dom dirêjtir e. Û çavlêkirina kureyane mîna peqîjkên sabûnê difirin.